# BUROYA KURDÎ
## *ya Pêwendî û Agahdariyê*

**Bultena agahdariyê N° 59 - Adar 2010**
Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles - Tél. 02 219 80 60
www.kurdishbureau.be kurdishbureau@scarlet.be

## XEBATA BUROYA KURDÎ

### *Sibat 2010*

**KONFÊRANS**

***12.02.2010 : Koçbûnên Kurdan li Ewropa, ji destpêka sedsala 20mîn heta nuha***




Pervîn Cemîl, seroka Buroya Kurdî, ev konfêrans ji bo Navenda Çanda Ewropî, rêxistineke navneteweyî ku ji aliyê UNESCO hatiye nas kirin, di çarçeva rêzeya 3mîn a konfêransên wê ya bi navê "Trajêdiyên sedsala XXmîn û Koçbûn" de, li Kommisyona Ewropî, kir.

Em li jêr metnê Banû Pervîn Cemîl, weka ku hat xistin nav dosya ku wê rojê ji beşdaran re hat dayîn, diweşînin:

Îro jimara koçberên kurd li Ewropa digihêje nêzîkî **1.5 – 2 milyon**. Piraniya wan li Almanya dijî. Li Beljîka ew nêzîkî 30.000 in.

Koçbûna kurdî li Ewropa bi pêlên cihê bû : **destpêka sedsala XXmîn, salên 1960, 1975, 1980, 1988-1989, 1991, 2004**.

**DESTPÊKA SEDSALA XXmîn : BIJAREYEKE RONAKBÎR Û RAMYARAN (SIYASETVAN)**

Di destpêka sedsala XXmîn de, çend dîplomat û ronakbîrên kurd gihajtin Ewropa. Emê çend kes ji wan, ên ku roleke girîng di dîrok û çanda kurdî de lîztiye û ku Kurd li Ewropa û Amerîka dane nasîn, bijimêrin :

**ŞERÎF PAŞA : 1865-1944**

Kurdê Tirkiyê, li Istanbûlê bûye, lê kurrê Kurdekî Iraqê, Seîd Paşa, ye. Piştî kutahkirina (xelaskirin) dibistana bilind li Istanbûlê, wî li dibistana leşkerî Saint-Cyr, li Parîsê, xwend. Li wê derê, ew ket bin kartêkirina (te'sîr) bîrên (fikir) dijberên (muxalif) rejîma osmanî, yên rêxistina "Ittihad ve Terakki Cemiyeti". Piştre, ew li Babi Ali'ya sultanê osmanî Abdulhamid bû yawer. Ew vegeriya Ewropa û li Bruksêl û Parîsê bû "attaché" leşkerî, û piştre li Stokholm û Berlînê bû balyoz (sefîr). Piştre, wî xwe ji karê xwe kişand û nêzîkî "Ittihad ve Terakki Cemiyeti" bû.

Ji nuh de li Parîsê, ji 1909 heta 1914, û piştre li Monte-Carlo, wî vê carê li dijî rêxistina Ittihad ve Terakki, ku pirr diktator bû bû, derket û xwe nêzîkî Kurdan kir.

Li dawiya Imperatoriya Osmanî, di 1919 de, ew li Konfêransa Aşîtiyê li Parîsê, ku tê de li ser çarenûsa

www.arsivakurdi.org

(qeder) gelên imperatoriya osmanî ya berê hat giftûbêj (munaqeşe) kirin, bû nimînendeyê rêxistina kurdî "Kürdistan Teali Cemiyeti". Wî tê de du "mémoires" (bîranîn) li ser daxwaziyên kurdî, tevî nexşeyeke Kurdistanê, pêşkêş kirin.

**ABDULRAHMAN BEDIR XAN : 1868 – 1936**

Endamê malbata mîrî ya perçiqandî ya Bedir Xan, ew direvve Ewropa. Di 1989 de, li Jenêvê hejmara 6mîn a rojnama kurdî « Kurdistan », ku birayê wî Miqdad li Qahirê, li Misrê, dest pê kiri bû ku biweşîne, derxist. Piştre, wî weşandina vê rojnamê li Folkston, li Ingilterê, ajot (dewam kir).

**MEWLANAZADE RIFAT : 1869 – 1930**

Ji Suleymaniyê (Kurdistana Iraqê) çû Istanbûlê. Li wê derê dibe berpirsiyarê rojnama Serbestî, ku di 1908 de hat weşandin. Ji aliyê sultanê osmanî Abdulhamid hukmê îdamê, ji bo ku wî ew di vê rojnamê de rexne dike, û piştre ji aliyê dijberiya tirkî „Ittihad ve Terakki", distîne, di 1909 de direvve Fransa û tê de, bi alîkariya Şerîf Paşa, weşandina rojnama Serbestî dajo (dewam dike).

**EKREM CEMÎL PAŞA (bavê Pervîn Cemîl) : 1891 – 1974**

Kurdê Tirkiyê, li Diyarbekirê bû. Bapîrê wî, Ahmed Cemîl Paşa, parêzgarê (walî) Yemenê bû. Di 1912 de, xwendina dibistana bilind li Istanbûlê kutah dike û dibe endamê rêxistina kurdî ya lêgal a pêşîn a xwendekaran li Istanbûlê, „Rêxistina Xwendekarên Kurd – Hêvî".

Di 1913 de, tevî çend endamên malbata xwe, ku ji wan pismamê wî Qedrî, diçe Lozan, Swîsrê, û piştre Gent (Gand), li Beljîka. Li wira endazî (hendese) dixwîne û dibe serokê şaxa Lozanê ya Hêvî. Di 1914 de, divê ku vegerê welêt ji bo ku, weka efser (zabit), beşdar bibe Şerrê Cihanê yê 1mîn.

Ekrem Cemîl Paşa nema vegeriya Ewropa, ji bo ku wî li Diyarbekirê, li Kurdistana Tirkiyê, xebat kir. Ew tê de bû serokê yekemîn ê rêxistina yekemîn a ramyarî (siyasî) a lêgal „Kürdistan Teali Cemiyeti", ku di 1918 de li Diyarbekirê ava bû. Heman (eynî) rêxistin li Istanbûlê jî, di heman salê de, ava bû. Piştî derbaskirina 3 salan li zîndanê, ew di 1929 de koç bû Sûriyê û tê de xebata ramyarî (siyasî) û çandî kir. Li Şamê di 1974 de wefat kir.

**KAMURAN BEDIR XAN : 1895 – 1978**

Endamê malbata mîrî ya navdar a Bedir Xan, li Istanbûlê bû. Bapîrê wî serhildana kurdî li dijî imperatoriya osmanî di 1843-1846 de kir.

Ji bo ku hemî endamên vê malbatê hatin perçiqandin, ew tevî birayê xwe Celadet neçar bû (mecûr bû) ku birevve Almanya. Li wê derê li zanîngeha Leipzigê doktora di huqûqê de stend.

Piştre, di 1930 de, her du bira li Sûriyê bi cî bûn û tê de xebata di heman demê de ramyarî û çandî kir. Standardkirina zimanî kurdî (zaravê kurmancî), ku ji aliyê nêzîkî 65% ji Kurdan li tevayiya Kurdistanê tê peyivîn berhema Celat bû. Wî alfabeya latînî û rêzimaneke kurdî li Şamê, bi hevkariya konsulê fransî li Urdunê, Roger Lescot, weşandin.

Di 1947 de, piştî xebateke çandî ya xurt li Beyrûtê, li Lubnanê, Kamuran li Parîsê bi cî bû û tê heta mirina xwe jiya. Wî tê de « Centre de Recherches Kurdes » (Navenda Lêgerînên Kurdî ), ku bultenek li ser pirsa kurdî diweşand, ava kir.

Di 1948 de, ew çû Amerîka û tê de ji sekreterê giştî yê UN'ê (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî) re „Memorandum"ek li ser rewşa giştî ya gelê kurd pêşkêş kir. Piştre, vegeriya Fransa û dest bi hînkirina zimanê kurdî li zanîngeha Sorbonê, li dibistana zimanên rojhilatî yên zindî, kir. Yek ji xwendekarên wî, Banû Blau Joyce, ku rayê (esl) wê beljîkî ye, ciyê wî stend.

Kamuran Bedir Xan jimareke mezzin a nivîsan, bi zimanên cihê, hişt.

**LEYLA BEDIR XAN : 1908 – 1986**

Li Istanbûlê, ji bavekî kurd „Abdurrezaq Bedir Xan" û diyeke polonî, Henriette, bû. Hunera lîzê „ballet" li Almanya hîn bû. Wê li ser dikkan (sahne), weka „ballerine", li Fransa, Beljîka, Hollanda, Ispanya, Swêd û Amerîka, lîzt. Li Fêstivala Salsburgê, wê rola sereke di „Belqîs, Şahbanuya Saba" de lîzt. Û wê lîzên kurdî jî lîztin. Rojname û kovarên fransî li ser wê nivîsî. Wê li Parîsê wefat kir.

**SALÊN 1960 : KURDÊN TIRKIYÊ**

Koçbûna girseyî (kitleyî) ya Kurdên Tirkiyê li Ewropa dema ku ku hukûmetên ewropî biryar stend ku bangî karkerên biyanî ji Tirkiye, Marokko ... bikin dest pê kir. Piraniya van karkerên kurd nuha li Almanya ne.

**SALÊN 1970 : KURDÊN IRAQ Û ÎRANÊ**

**1975 : KURDÊN IRAQÊ**

Piştî Peymana Cezayirê di navbera Iraq û Îranê de, tevgera leşkerî ya Mustafa Berzanî, serokê efsaneyî yê Kurdan, piştî liberxwedaneke mezzin ku di 1961 de dest pê kiri bû, hilweşiya. Gelek Kurên Iraqê ber bi Ewropa revviyan.

**1979 : KURDÊN ÎRANÊ**

Ayatollah Xomeynî li Îranê gihajt desthilatê û tê de Komara Islamî ava kir. Wî li Kurdisanê terror belav



www.arsivakurdi.org

kir. Bi hezaran Kurd hatin îdam kirin yan xistin zîndanan û êşkence kirin. Wî got ku gotina „otonomî”, ku Kurd dixwest, di Qur”anê de nîn e !

**SALÊN 1980**

**1980-2010 : KURDÊN TIRKIYÊ**

Piştî darbeya leşkerî ya gelek giran a 12 Îlon 1980 li Tirkiyê, jimareke mezzin ji ronakbîr û çalakvanên kurd ber bi Ewropa, nemaze Swêdê, revviyan. Piştre, di 1984 de, PKKê şerrê çekdarî, ku heta nuha dajo, dest pê kir.

**1980 – 1988 : KURDÊN ÎRAN Û IRAQÊ**

Saddam Huseyn şerrekî dirêj li dijî Îranê ajot. Li dawiyê, tu yek ji wan bi ser ne ket, lê li her du aliyan milyonek mirî bû.

**1983 : KURDÊN IRAQÊ**

Saddam Huseyn 5.000 kes ji malbata Berzanî „da hunda kirin“. Laşên çend send ji wan li gorên hevrayî, li Başûrê Iraqê, hatin dîtin.

**1987-1989 : KURDÊN IRAQÊ**

Êrîşa ku Saddam Huseyn navê wê kir „Enfal“. Ev gotin di sûreteke Qur’anê de heye û tê de ferman ji şervanên Islamê re tê dayîn ku kafiran bikujin û hebûn û jinên wan bistînin. Li gora rappora rêxistina mafên mirov a amerîkî, Human Rights Watch, nêzîkî 182.000 kes hatin xistin gorên hevrayî.

**1988 : KURDÊN IRAQÊ**

Saddam Huseyn çekên şîmîk avêtin ser rûniştvanên bajarê piçûk ê Halabca. 5.000 kes festisîn û bi hezarên din jî heta nuha ji kartêkirina (te’sir) wan nexweş in. Gelek Kurdên Iraqê reviyan Ewropa.

**KURDÊN YEKÎTIYA SOVYÊTÎ YA BERÊ**

Piştî hilweşana kommunîsmê li Yekîtiya Sovyêtî, neteweperestî li herderî bilind bûn. Kurdên Ermenistan, Gurcistan, Azerbaycanê ... bi girseyî reviyan Rûsya û Ewropa Rojavayê.

**SALÊN 1990 – 2000**

**1991 : KURDÊN IRAQÊ**

Saddam Huseyn şerrê Kuweytê kir. Kurdên Iraqê ji vê rewşê kelk (istifade) girt û serî hilda, lê ew bi hovîtî hatin perçiqandin. Nêzîki milyonek Kurd nemaze ber bi Tirkiye û Îranê reviyan.

**2004 : KURDÊN SÛRIYÊ**

Di 12 Adar 2004 de, serhildaneke kurdî li Qamişlî bû û piştre belav bû hemî bajarên kurdî û ne kurdî, Şam û Heleb jî ku tê de civateke kurdî ya mezzin dijî.

**REWŞA NUHA LI EWROPA**

Nuha, Kurdên Ewropa heman (eynî) zoriyên civakî, aborî û çandî yên koçberên din dijîn, lê bi ser de jî pirsa zanava (nasname, kimlik, hewiyye) wan heye, ji bo ku dewleta wan nîn e. Li gel vê yekê, ew kêm zêde pirsên xwe çare dikin û ji wan beşeke girîng ji ronakbîr, lêger, perpirsiyarên rêxistinên çandî û partiyên ramyarî (siyasî) heye. Bi saya pêşdeçûna têknolojiya agahdariyê ji 20 salan de pêwendiyên Kurdan, bi riya têlêfonên dest „GSM, Mobile“, malperên entêrnêtê yên cihê û nêzîki 10 têlêvîzyonên bi satêlît, xurttir bûn. Bi ser de jî, ji 2003 de, mêjuya (tarîx) avabûna herêmeke fêdêral li Kurdistana Iraqê, jimareke mezzin ji Kurdên hemî cihanê diçin seredana wê, ji bo ku bi çavên xwe beşa tenê ya azad a Kurdistanê, ku pirr zû pêş de diçe, bibînin.

***21.02.2010 : Wêneyên kevn û nuh ên Kurdistan û Kurdan***




Rênas Newrozî, rojnamevan û sekreterê Buroya Kurdî, di destpêkê de li ser girîngiya wêne (resm) û fotografiyê di dîroka mirovahiyê de got. Mirovên pêşîn wêne di şkeftan da bi kar dianîn ji bo ku bi wan tiştên ku hîn nikari bûn bi axaftin bêjin ravebikin. Fotografî jî di 1826 de ji aliyê fotografê pêşîn, Joseph Nicephre Niepce, yê fransî, hat afirandin.

Eger em werin Kurdistanê, kesên ku tê de garriya bûn yan jî jê derbas bû bûn tê de wêne çêkiri bûn û fotoyan stendi bûn. Di nîvê 2mîn ê sedsala 19mîn de, kamêra bi riya gerrvanan û malbata şahî ya Îranê ket Kurdistanê. Di destpêka sedsala 20mîn de, ew bi riya hêzên leşkerî yên rûsî û ingilîzî ketin navê. Di nîvê sedsala 20mîn de, gelek rojnamevan û gerrvanên ewropî û amerîkî fotoyên Kurdistan û Kurdan stendin.

www.arsivakurdi.org

Eger em werin Kurdan bixwe, Huseyn Huznî Mukriyanî Kurdê pêşîn bû ku kamêra wî di salên 1920-1930 de hebû. Û wênekêşê (ressam) kurd ê pêşîn ku wêneyên kesahiyên navdar çêkirin Bedîh Babacan bû.

Li dawiyê, Newrozî li ser kartêkirina (te'sîr) fotografiyê peyivî û got ku wêneyek yan fotoyek dikare ji hezar gotinan bêtir ravebike (bêje). Û wî albumên ku tê de nêzîkî 2.000 fotoyên Kurdistanê hene di nav beşdaran de gerrandin : kevneşopên dîrokî, bajarên kevn û nuh, xweza (tebi'et), kes, kesahiyên navdar ...

Rênas Newrozî pirtûkeke bi navê „100 sal di dîroka rojnamevaniya kurdî, 1898 – 1998, de) amade dike. Ewê di vê pirtûkê de nêzîkî 2.000 fotoyên rojname, kovar ... ên kurdî hebin. Ew beşek ji arşîva wî ku tê de nêzîkî 8.000 foto hene ne.

**HEVPEYVÎN**

***20.02.2010*** : Birêvebirê beşa kurdî ya radyoya ostralî SBS, Şahînê Soreklî, hevpeyvînek bi Pervîn Cemîl re li ser konfêransa wê ya jorîn, ya 12.02.2010, kir.

***21.02.2010*** : Rojnamevan Naske Zade, ji beşa kurdî ya radyoya Dangê Amerîka, bi Rênas Neworzî re, li ser konfêransa wî ya wê rojê hevpeyvînek kir.

# NÛÇE JI KURDISTANÊ

## *Février 2010*

## KURDISTANA TIRKIYÊ

**HEV-SEROKÊN NUH ÊN PARTIYA „BDP"ê**



***Di 01 Sibat 2010 de***, partiya nuh ku bi awakî ne fermî kurdî ye, « BDP », ku piştî girtina „DTP"ê ava bû, kongreya xwe li Ankara kir. Tê de du hev-serok, Selahattin Demirtaş û Banû Gülten Kışanak, hatin hilbijartin.
*(netkurd.com, 01.02.2010; peyamner.com, 02.02.2010)*

**DADGEHA EWROPÎ YA MAFÊN MIROV TÎPÊN KURDÎ QEDEXE DIKE !**
***Di 02 Sibat 2010 de***, Dadgeha Ewropî ya Mafên Mirov li Strasburgê daxwaziya 8 Kurdan ku dixwest ku navên kurdî bidin zarokên xwe ne pejirand (qebûl ne kir, red kir). Sedema biryara dadgehê ew e ku tîpên kurdî, Q, X, W ... di zimanê tirkî de û di klavyeyên kompyûteran de nîn in !

Dadgehê ji Tirkiyê jî xwest ku olan (dîn) ji kartên zanavê (kimlik, hewiyye) derxîne.
*(netkurd.com, 02.02.2010)*

**NAVEKÎ KURDÎ JI TAXEKÊ RE**
***Di 09 Sibat 2010 de***, encumena şaredariya Wêranşarê biryar stend ku navê taxa Kenan Evren (gênêralekî kevn ê tirk) bike Azadî.
*(rudaw.net, 10.02.2010)*

**1500 KES TÊN RAGIRTIN**
***Di 10 Sibat 2010 de***, serokê nuh ê partiya kurdî BDP, Selahattin Demirtaş, di daxuyaniyeke çapemeniyê de got ku ji 14 Nîsan 2009 de, 1.500 kes hatine bin çav kirin û ku ji wan 900 kes hatin xistin zîndanê.
*(avestakurd.net, 11.02.2010)*

**KURDISTAN DI PIRTÛKÊN DIBISTANÎ DE !**




www.arsivakurdi.org

Xwendekarên dibistanên seretayî (pêşîn) yên bajarê tirkî Konya, dema ku pirtûkên nuh ên dibistanî ku tê de gotina « Kurdistan »ê li ser nexşeya erdnigariyî (cogxrafî) ya Tirkiyê hati bû nivîsîn dîtin, di bin şokê de man (gelek şaş bûn) !

Ev pirtûk weka « test » (tecrube) ji aliyê şîrketa Yayın Group hati bûn çêkirin, lê berê ku ew wan li dibistanên Konya belav bike ew baş çavdêrî (kontrol) ne kiri bûn. Şîrketê tavil (pirr zû) ji gelheya tirkî buhurandin (efû) xwest.
*(Hürriyet, rudaw.net, 13.02.2010)*

**PROJEYEKE BIRYARÊ LI SER DERSÎMÊ**
***Di 12.02.2010 de***, parlementerê serbixwe Kamer Genç ji parlementê re projeya biryarekê pêşniyar kir. Wî tê de ji dewleta tirkî re pêşniyar kir ku malbatên qurbanên êrîşên leşkerî li Dersîmê qerebû (taviz) bike û ji wan buhurandinê (efû) bixwaze (ji bo qirkirinên mezzin û sirgûnkirinên ku piştî serhildana 1937 bûn).
*(rizgari.org, 13.02.2010)*

**SERSALIYA 11mîn A RAGIRTINA ABDULLAH ÖCALAN**
***Di 14 Sibat 2010 de***, rojek berê sersaliya 11mîn a ragirtina serokê PKK, Abdullah Öcalan, hev-serokên partiya nuh BDPê, Selahattin Demirtaş û Banû Gülten Kışanak, bangî Kurdan kir ku derkevin kuçan û dengê xwe bilind bikin. Wan pêla ragirtinên ku ji çend mehan de dajo (dewam dike) riswa (protêsto) kir.
*(netkurd.com, 14.02.2010)*

**POLÎSÊ TIRKÎ BI KURDÎ BANG DIKE !**
***Di 14 Sibat 2010 de***, ji bo riswakirina (protêstokirin) girtina serokê PKKê, Abdullah Öcalan, di 15 Sibat 1999 de, komeke cuhanan riya Cizîr-Idilê girt. Dema ku polîs tecrube dikir ku wan belav bike, bangî wan û malbatên ku hêsa bibin bi zimanê kurdî kir !
*(rizgari.org, 14.02.2010)*

**49 EFSER Û 18 SERBAZ TÊN RAGIRTIN, DOZA ERGENEKONê (dûmahîk)**
***Di 22 Sibat 2010 de***, di çarçeva doza Ergenekonê de (li bultenên me yên buhurî binêre), û di tevgereke lêgerînê li Ankara, Istanbul û Izmirê de, 49 efserên (zabit) kevn û nuh hatin bin çav kirin. Ji wan fermandarê berê yê beşa 1 a leşkerî, general Çetin Doğan; fermandarê berê yên hêzên ezmanî, Ibrahim Fırtına û gênêralê berê Engin Alan ku serokê PKKê, Abdullah Öcalan, di 1999 de, û yek ji serokên vê partiyê, Şemdin Sakık, da bû ragirtin. Ew bi amadekirina darbeyeke leşkerî, bi navê "Balyoz", di 2003 de, hatine tawanbar kirin (bi sûc kirin).
*(CNNTürk, netkurd.com, Kurdistan-news.net, avestakurd.net, 22.02.2010)*

***Di 26 Sibat 2010 de***, di çarçeva heman (eynî) tevgerê de, 18 serbaz (esker) li 13 bajaran hatin ragirtin. 7 ji wan li 6 bajarên Kurdistanê, Diyarbekir, Farqîn, Şirnex, Batman, Mardîn û Elazîzê, hatin ragirtin.
*(netkurd.com, 26.02.2010)*

**PASAPORTÊN IRAQÎ JI SEDEMA ZIMANÊ KURDÎ NAYÊN PEJIRANDIN !**
Ji bo cara pêşîn, hukûmeta iraqî pasaportên nuh bi navê "Type-A", ku bi erebî, kurdî û ingilîzî, hatine nivîsin, derxistin. Wezîrê iraqî yê hundir daxuyand ku hemî welatên hevsî (cîran) ên Iraqê, ji derveyî Tirkiyê, ji sedema zimanê kurdî, ew pejirandin (qebûl kirin) !
*Azady.nl, E-Kurd, Hawlatî, 23.02.2010)*

**14 RADYO Û TÊLÊVÎZYON BI KURDÎ**
Encumena bilind a guh-çavî (RTÜK) ji 14 radyo û têlêvîzyonan re destûr (izin) da ku di rojê de 24 katjmêran (saetan) bi zimanê kurdî û yên din, ku ne tirkî ne, biweşînin.
*(netkurd.com, 23.02.2010)*

**ZAROKÊN KURD TÊN TAWANBAR KIRIN**
Dadgeha cezayên giran a Diyarbekirê 5 zarokên kurd bi 7 sal û 5 meh zîndan tawanbar (mahkûm) kirin. Tawana (sûc) wan ew e ku di dema seredana serokwezîrê tirk Recep Tayyıp Erdoğan Diyarbekirê de, wan kevvir avêtin polîs.
*(netkurd.com, peyamner.com, 24.02.2010)*

**ŞAREDAREKÎ KURD TÊ TAWANBAR KIRIN**
***Di 24 Sibat 2010 de***, dadgehek şaredarê kurd ê Sêrtê, Selim Sadak, bi 10 mez zîndan, ji bo axaftineke ku di 15 û 16 Tebax 2009 de, li fêstîvalekê li Eruhê, kiri bû, tawanbar (mahkûm) kir.
*(avestakurd.net, 25.02.2010)*

**SÊ ENDAMÊN PARTIYA HAK-PARê TÊN TAWANBAR KIRIN**
***Di 26 Sibat 2010 de***, sê endamên şaxa Nuseybînê ya partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, HAK-PARê, Salıh Alper, Ayhan Demir û Bunyamin, bi 5 meh zîndan hatin tawanbar kirin, ji bo ku wan di kampanya hilbijartinên taxî de belavokên bi kurdî belav kiri bûn.
*(netkurd.com, 27.02.2010)*

www.arsivakurd.org

# KURDISTANA IRAQÊ

## HALABCA WEKA NIJADKUJÎ TÊ NASÎN

Dema ku Elî Hesen El-Mecîd, ku bi navê „Elî Kîmyawî“ hatiye nasîn, di 25 Çile 2010 de hat îdam kirin, dadgeha iraqî ew bi kirina cinayeteke li dijî mirovahiyê tawanbar kir (li bultena me ya buhurî binêre), lê Kurd riswa (protêsto) kir û xwest ku qirkirina Halabca bi çekên şîmîk di 1988 de weka nijadkujî bê nasîn û çûn ber dadgeha hawarê. Vê carê, dadgehê ew weka nijadkujî (génocide) pejirand (qebûl kir).

*(TV û çapemeniya kurdî)*

## VEKIRINA KONSULXANEYEKE SWÊDÎ



***Di 26 Sibat 2010 de***, konsulxaneyeke swêdî li Hewlêrê hat vekirin. Merasîm bi amadebûna serokwezîrê kurd Behrem Salih, serokwezîrê Iraqê Hişyar Zîbarî (Kurd), wezîrê karên derve yê swêdî Carl Bildt û balyozê (sefîr) Swêdê li Iraqê, Nikolas Trofya bû.

*(pukmedia.com, netkurd.com, avestakurd.net, 26.02.2010)*

# KURDISTANA ÎRANÊ

## GIRTIYEKE KURD DI MANGIRTINÊ DE YE

***Di Sibat 2010 de***, xwendekareke kurd a beşa civakzaniyê (sosyolojî), Pexşan Ezîzî, ji bajarê Mahabadê, 24 salî, ku ji 3 mehan de li zîndana Tehranê hatiye girtin, dest bi mangirtinekê (grêva birçîbûnê) kir. Ew gelek nexweş e û hêzên ewlehiyê (emniyyet) yên îranî çend caran soz da ku wê azad bikin, lê soza xwe ne girt. Du hevalên wê, Sirwe Weysî û Leyla Muhemmedî, çalakvanên mafên sîvîl li kêleka Pexşan Ezîzî, li hemberî dayîna pere hatin berdan.

*(avestakurd.net, 27.02.2010)*

www.arsivakurd.org

### SÊ RAMYARIYÊN KURD TÊN TAWANBAR KIRIN

***Di Sibat 2010 de***, endamekî encumena navendî ya partiya kurdî Yekîtî, Hesen Halih, ji aliyê dadgeha leşkerî li Qamişlî bi 8 meh zîndan, ji bo *„endambûna rêxistineke qedexe û handana kîna olî“*, hat tawanbar kirin. Di heman (eynî) dozê (da'wa) de, du endamên vê partiyê, Şehbaz Nezîr Ismaîl û Siwar Ebdilrehman Derwîş, bi 4 meh zîndan hatin tawanbar kirin.
*(yekitimedia, 17.02.1020)*

### DADGEHEKE BELJÎKÎ 33 KURDAN BÊTAWAN DIKE

***Di Sibat 2010 de***, dadgeheke beljîkî 33 Kurdên Sûriyê bêtawan (bê sûc) kir. Wan di 2005 de, di xwepêşandaneke (meşîn) li dijî kuştina şêxê kurd ê pêşverû, Şêx Maşûq El-Xeznewî, de êrîşî balyozxana (sefaretxane) sûrî li Bruksêlê kiri bû. Zararên li hundirê balyozxanê gihajtin 15.000 €. Dadgehê daxwaziyên dozkarê giştî (procureur général) ne pejirandin (red kirin).
*(rudaw.net, 24.02.2010)*

### JI SEDEMA TÎPÊN KURDÎ DU KURD TÊN RAGIRTIN

***Di 18 Sibat 2010 de***, du Kurd ji aliyê hêzên ewlehiyê (emniyyet) li Amûdê hatin ragirtin : Gulfiroşek, Alan Ehmed Huseyn, û karbidestekî (me'mûr) firoşgeheke (dikkan) enformatîkê, Mustezer Ehmed Xelef, ji bo ku tîpên kurdî bi kar anîn ! Her du bi amadekirina karên pîrozkirinê ji bo dawetekê hatin tawanbar (bi sûc) kirin ! Piştî ragirtina wan, ew hatin birin Qamişlî. Tukes çarenûsa (qeder) wan nizane.
*(kurdwach.org, netkurd.com, avestakurd.net, 25.02.2010)*

## NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ

### KONFÊRANSEK LI PARLEMENTA EWROPA

***Di 03 û 04 Sibat 2010 de***, konfêransa salane ya 6mîn, bi navê « EU, Turkey and the Kurds » (Yekîtiya Ewropî, Tirkiye û Kurd), li Parlementa Ewropa, ji aliyê rêxistina « EU-Turkey Civic Commission » û Koma Çepê Yekbûyî ya Ewropî/Çepê Kesk ê Skandinavî, ya Parlementa Ewropî, hat pêk anîn.

Konfêranskerên kurd, tirk û ewropî tê de peyivîn. Parlementerên ewropî ji komên ramyarî (siyasî) yên cihê bûn. Li dawiyê, daxuyaniyeke dawîn « Final Declaration » hat xwendin. Ew nemaze ji dewleta tirkî dixwaze ku tavil (pirr zû) bombekira Kurdistana Iraqê rawestîne û ji bo dîtina çareyeke ramyarî (siyasî) ji pirsa kurdî re bi PKKê re dyalogê bike.
*(Buroya Kurdî, 05.02.2010)*


### « UN » CÊJNA NEWROZÊ NAS DIKE


***Di 23 Sibat 2010 de***, civîna giştî ya UNê (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî), di civîna xwe ya 71mîn de, cêjna Newrozê weka mîrsareke çandî û moral (ma'newî) ya mirovahiyê û cêjneke fermî (resmî) nas kir. Berê jî, UNESCO ew nas kiri bû.

UNê di daxuyaniyeke çapemeniyê de got ku li cihanê ji 300 milyon kes bêtir Newrozê weka destpêka saleke nuh dibîne û ku ji 3.000 salan bêtir de ev cêjn li navçeyên Balkan, Deryayê Reş, Qesqasya, Asya Navendî û Rojhilata Navîn tê pîroz kirin.
*(peyamner.com, rudaw.net, avestakurd.net, 25.02.2010)*

Cihêtî (ferq) di navbera Newroza kurdî û yên din de ew e ku li bal Kurdan ev cêjneke neteweyî û ramyarî (siyasî) ye. Ew ne bitenê destpêka jiyanê di beharê de (21 Adar) « sembolize » dike, lê li ser bingeha efsaneyeke kevnar, ya ji dema Medan, bapîrên Kurdan, de bûye :

www.arsivakurd.org




**PIRTÛKEKE JÎNENÎGARIYÎ**

Nivîskarê kurd Doğan Ceren pirtûkeke jinenîgariyî bi tirkî li ser ronakbîrê kurd Osman Aydın, bi sernivîsa « Kürt Tarihinde Bir Yaprak » (Rûpelek di Dîroka Kurdî de), nivîsî.

Bi awayê hevpeyvînekê, nivîskar dîtineke tam li ser vê kesahiya orîjînal dide me. Huqûqzan û mîlîtanekî kurd, Osman Aydın bi dehan car, di navbera 1968 û 1990 de, li Tirkiyê hat zîndan û bi hovîtî êşkence kirin. Ew neçar bû ku koçî Almanya bike û heta nuha li wira dijî.

Nivîskar Doğan Ceren jî 5 salan, ji 1981 heta 1986, hat zîndan û gelek êşkence kirin. Ew di 1987 de pena bû Swîsra û heta nuha tê de dijî.

BRUSSELS HOOFDSTEDELIJK GEWEST
VLAAMSE GEMEENSCHAPSCOMMISSIE

Ev bulten, bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC), bi kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî hatiye weşandin.

www.arsivakurdi.org